Kurdistan

Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin

PDK-S Partiya Demokrata Kurdistan - Sûriya 1957

Rojnamakurdistan.com | Kurdistan-Hejmar (256) | Çirya Paşîn / 01-11-2023

# Biryara Serok Barzanî ya şandina Pêşmergeyên Kurdistanê bo Kobanê dîrokî bû




Kurdistan

Neh sal di ser çûna hêzên Pêşmergeyên Kurdistanê bo Kobanê derbas dibin. Li Kobanê, Pêşmergeyan balansa şer guherî û di encamê de DAIŞê hat şikandin û Kobanê ji ketin û dagîrkirinê rizgar bû. Piştî azadkirina Kobanê û bidawîbûna şer, Pêşmergeyan çekên xwe bexşandin hêzên li wî bajarî û ti destêwerdanek di karûbarên navxweyî yên Kobanê û Kurdistana Sûriyê de nekirin û vegeriyan Başûrê Kurdistanê.

Berî neh salan, piştî 134 rojan ji berxwedana şervanan li hember çekdarên DAIŞê, roj bi roj dorpêça li ser hêzên li ser erdê zêdetir dibû, nêzîkî 80 ji sedî ji bajarê Kobanê ket destê terorîstên DAIŞê û hezaran jî xelk koçber bû. Wê demê li ser dawaza Serokê Barzanî, hêzên Pêşmergeyên Kurdistanê ji bo Kobanê hatin şandin û bi hevkariya Hevpeymanan, şer di berjewediya Kurdên Kurdistana Sûriyê yekalî bû û tevahiya bajêr hat rizgar bû.

Roja 22/10/2014an, Parlementoya Kurdistanê li ser daxwaza Serok Barzanî, ji bo gotûbêjkirina rewşa Kobanê civiya. Di civînê de, Parlemantoya Kurdistanê bi koma dengan daxwaza Serok Barzanî ya ji bo şandina Pêşmergeyan bo Kobanî û alîkariya Kurdên Kurdistana Sûriyê bi awayekî fermî pesend kir.

Roja 28/10/2014an, yekem karwana hêza Pêşmerge ku hejmara wan 150 Pêşmerge bû, bi çekên sivik û giran bi 40 otomobîlên leşkerî ber bi Kobanê ve bi rê ket û bi dirêjahiya rê ji Başûr, Bakur û heta gihîştina Kurdistana Sûriyê, welatiyên Kurd bi ala Kurdistanê, sirûda niştimanî, çepik û tilîliyan pêşwazî li hêza Pêşmerge kirin, ji ber ku bi nerîna Kurdên her çar perçeyên Kurdistanê, şandina hêza Pêşmerge bo Kobanê, bûyereke dîrokî bû.

> «Bi gihîştina hêza Pêşmerge, balansa şer hat guhartin»

Herwiha şandina hêza Pêşmerge bo Kobanê, karvedaneke navdewletî jî li pişt xwe anî û beşeke mezin a medyaya cîhanê romala çûna Pêşmergeyan di nava xaka Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê re bo Rojavayê Kurdistanê kirin. Bi gihîştina hêza Pêşmerge, balansa şer hat guhartin û di demekê de ku tenê ji sedî 20 ji Kobanê di destê hêzên li wir de mabû, Pêşmerge û wan hêzan mil bi milê hev girtin û rûbirûbûyî DAIŞê bûn. Girê Kaniya Kurdan û taxa Meştel ku dawî xala rojhilatê bajêr bû, ji destê çekdarên DAIŞê derbixin û piştre navenda bajêr jî bi temamî ji DAIŞê pak bikin û Kobanê ji metirsiya ketinê rizgar bikin. Di roja 20/1/2015an de, yekem şehîdê Pêşmerge yê bi navê Zêrevan Ekrem li Kobanê giyanê xwe pêşkêşî xaka Kurdistanê kir û şehîd bû. Hejmarek Pêşmergeyên din jî birîndar bûn.

Pêşmergeyên Kurdistanê li ser daxwaza hêzên ser erdê, wek hêza piştevaniyê beşdarî di şer de kirin, piştî bidawîbûna şer û erkê wan, çekên xwe bexşandin wan hîêzan û bi serbilindî vegeriyan Başûrê Kurdistanê, bêyî ku destêwerdanê di rewşa Kobanê û Rojavayê Kurdistanê de bikin.Li gor amaran, di şerê Kobanê de zêdetir ji 2 hezar û 800 çekdarên DAIŞê hatin kuştin. Beşeke mezin ji bajarê Kobanê ji ber şer wêran bû.

**Serok Barzanî û Desteya Serokatiya ENKSê civiyan** — *Rûpel—2*

**Behzad Dorsin.. Têkoşerê azadî û rêbaza Kurdayetiyê** — *Rûpel—3*


**39 sal in Cegerxwîn ji nav me bar kiriye** — *Rûpel—4*

# Serok Barzanî û Desteya Serokatiya ENKSê civiyan

Kurdistan

Serok Mesûd Barzanî û Desteya Serokatiya Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê (ENKS) astengî û kêşeyên li pêşiya gelê Kurd li Sûriyê gotûbêj dikin. Serok Mesûd Barzanî roja 24ê Cotmehê pêşwazî li Desteya Serokatiya Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê (ENKS) kir.Li gorî daxuyaniyeke Baregeha Barzanî, di civînê de, dawî guhartinên siyasî yên Sûriye û navçeyê hatin gotûbêjkirin. Her di vê civînê de, ronahî hate xistin li astengî û kêşeyên li pêşiya gelê Kurd li Sûriyê.





# Werzê çinîna zeytûnan li Efrînê û astengiyên li pêş cotyaran

Kurdistan

Bi hatina werzê çinîna zeytûnan li herêma Efrînê re, grûpên çekar, bacên giran li ser cotkarên Kurd ferz dikin. Grûpa çekdara bi navê Sultan Murad ji bo her dareke zeytûnê, du dolar wek bac li ser cotkarên li gundên navçeya Şera ferz kiriye.

Heman grûpa Silêman Şah (Emşat) li gundên navçeya Şiyê jî, baca 3.5 dolar li ser her dareke zeviyên ku xwediyên wan li gund in ferz kiriye û baca 20 dolaran li ser darên ku xwediyên wan koçber bûne ferz kiriye. Ji aliyekî din ve jî, grûpa Emşatê nirxê guvaştina zeytûnan wek %10 li kargehên guvaştina zeytûnan ferz kiriye, ku dê %5 ji bo kargehan be û %5 jî ji bo grûpa Emşat be. Baca ku li ser darên zeytûnan ji aliyê grûpên çekdar ve tên ferzkirin, gelekî giran e ji ber ku tiştek ji dahata wan daran ji cotkaran re namîne.



> «Bacan rewşa cotyaran zehmet kiriye»

Eger ji cotkarekî re 300 darên zeytûnan hebe, dê neçar be 1050 dolaran wek bac bide, eger heqê cot û xizmetkirina daran jî bi ser de were hejmartin, ji dahata wan 300 daran, tiştek ji cotkaran re namîne.

Ji sala 2018an ve Tirkiyê û grûpên çekdaran herêma Efrînê control kirin û ji wê demê de, ji bilî tawanên kuştin, revandin, dizî û talana mal û milkên welatiyên Kurd, grûpên çekdaran dest danîne ser gelek dar û zeviyên koçberên Kurd, zeyt û zeytûnan didizin û bacên giran li ser berhemên çandiniyê ferz dikin. Herêma Efrînê ku bi darên zeytûnan naskirî ye û nêzîkî 20 milyon darên zeytûnê lê hene, di çend salên borî de û li gorî medyaya navdewletî, berhemên zeytûnan bûne çavkaniyeke dahatê ji grûpên çekdar re.

# Behzad Dorsin.. Têkoşerê azadî û rêbaza Kurdayetiyê


Neşet Zaza


Mihemed Salih


Nafih Ebdulah

Hêvî Delî-Qamişlo

Hejmarek ji kesayetiyên Kurd xwedî rol û bi bandor di tevgera siyasî û Kurdî de navên xwe di dîroka Kurdayetiyê û mêrxasiyê de nexişandin e, û kesayetiya xwe ji bo kar û xizmeta azadiya milet û mafê gelê xwe li Kurdistana Sûriyê de terxan dikin, yek ji wan xebatkaran "Behzad Dorsin" Bavê Pîran ku hertim di bîr û baweriya miletê xwe de ye. Di 24ê Cotmeha 2012an de, Behzad Dorsin ligel Nîdal Osman " endamê PDK-Sê hatin revandin û ta niha çarenivîsa we nediyar e. Di 11'emîn salvegera revandina xebatkar "Behzad Dorsin" Endamê Mekteba Siyasî ya Partiya Demokrata Kurdistan-Sûriya.

Neşet Zaza, Serokê ofîsa karûbarên Encûmanên Xwecihiyên ENK-Sê, wiha ji Rojnameya Kurdistan re anî ziman: Behzad Dorsin kesayetekî azadîxwaz û welatparêz bû di tevgera siyasiya Kurdî de, û hezkiriyê dibistan û rêbaza Barzanî û Kurdayetiyê bû, kar û xebata xwe ya Netewî û niştîmanî di ber doza azadiya mafê miletê xwe de dikir li Kurdistana Sûriyê de. Herwiha "Zaza" berdewam kir û got, dibe ku rejîm karîbe xebatkar "Behzad û hevalên din yên têkoşer ên ku bi dadmendî û armancên vê dozê bawer in ji qada siyasî dûr bixin, lê ew nikarin vîn û hizir û ramanên wan yên niştîmanî û bîr û baweriyên wan bi rêbaza Barzanî û Kurdayetiyê dûrbixin, hêsane ku destê xiyanetê bigihêja têkoşîn û azadîxwazan, lê nikarin xewna miletekî di dilê her kesekî ku ji nirxên jiyanê û mafên gelan ji holê rake. Di dawiyê de " Zaza" hêvî xwest xwedayê mezin aramî û selametiyê bide gelê me û di demeke nêzîk de her têkoşerekî ku bi zorê di nav malbat û hezkiriyên xwe de hatine girtin azad bibin û bi taybetî hevalê Behzad û hemû hevalên ku pê re ne.

Ji aliyê xwe ve, Endamê Komîteya Navendî ya Partiya Demokrata Kurdistan-Sûriya Mihemed Salih Şelal wiha ji Rojnemaya Kurdistan re got: Bavê Pîran wek min naskirî têkoşer, xebatkar, siyasetmedarekî leheng û çalak, rewşenbîrekî paye bilind û Kurdperwerekî xwedan şan bû di nav refê bizava Kurdî de, hevalê Behzad di destpêka xebata xwe de min li Dêrika Hemko naskir wek berpirsek ciwan û çalak di nav refê partî de, gelek mifa ji ezmûna wî wergirt û yek ji wan kesên bi erênî bandora wî li ser min hebû û bi saya serê wan bîr û baweriyê min hatin avakirina li ser rêbaza pîroz rêbaza Barzaniyê nemir, li gor nasîna min bawerî bi karê hevbeş û bi rêxistinî hebû, xwe didît şagirtek di dibistana Barzanî de, dil fireh û dilpak bû piştgir bû ji hevalê xwe re, jiyana xwe terxan kiribû ji xebatê re ji bo pêkanîna mafê rewa ji gelê xwe yê hejar û bindest re. Ji vê yekê bû armanc ji nehez û dujminê Kurdayetiyê re û bi mixabinî ve karîbûn vî têkoşerî desteser û bin çav bikin, bê guman wan bi desteserkirina Kurdperwerên mîna Behzad Dorsin û bi terorkirina kesên mêrxas û leheng mîna pakrewan "Nesredîn Birhik" wê bikarbin mûma xebata partî û rêbaza Barzanî vemirînin, lê ew xewn û xeyala ji wan re. Karwanê xebatê berdewam e û rêç û rêbaza xebatkar Behzad Dorsin û pakrewan Nesredîn Birhik armanc û nîşane û dê berdewam bin li ser rêça wan ta pêkanîna wan armancên Behzad Dorsin li ser hatî bin çavkirin.

Nafih Ebdulah, Endamê Komîteya Navendî ya Partiya Demokrata kurdistan-Sûriya, ji Rojnameya Kurdistan re got: hevalê têkoşer Behzad Dorsin ji bo rola wî ya berbiçev di hemû waran de, him di warê civakî,siyasî û rewşenbîrî de, herwiha karê wî yê berdewam di partî û Encûmena Niştîmaniya Kurdî de û helwestên wî ji bo piştgiriya şoreşa Sûrî û tevlîbûna wî di çalakiyên ciwanan de li bajarê Dêrikê û bi rola xwe ya giring bi navê partî beşdar dibû, ji vê yekê rastî gefan dihat herwiha ji bo Sûriyeke nû, Sûriyek nenavendî, Sûriyek yekgirtî bi rejîmek perlemanî, demokrat ev armanc û pirinsîpê wî bûn, û ji ber dûrxistina Behzad ji karê siyasî di partî û helwestên wî yên niştîmanî netewayî di roja 24ê Cotmeha 2012an, di navbera gundê Mela Mezrê û Şekir Xaçê de hate girtin ligel Nîdal Osman ji aliyê çekdarên PYDê ve, û ji bo azadiya Dorsin li bajarê Dêrikê û hemû bajarokên Kurdî xwepêşandan û mangirtin lidarxistin, lê heta roja weku îro çarenivîsa wî nediyar e.



Ji rexekî din ve, Ebdulah di vê derbarê de behis kir ku Dorsin di nav gelê xwe de li deverê niştîmanperweriya xwe dihat naskirin û kar wî yê netewî û bi mêranî daxwaza mafê gelê xwe dikir û xebata xwe di partî û ENKSê de dikir û ti carî astengî ,girtin nedibûn kelem li pêşiya qeliskirina fikir û ramanên wî û karê wî li ser rêbaza dibistana Barzaniyê nemir. Di dawiyê de Ebdulah ew hêviya serbestberdan û azadiyê ji bo hevalê xebatkar Behzad Dorsin, û ku her wê li bîr e miletê xwe de bimîne heta roja azadiya wî.. Û hêjaya were gotin ku Xebatkar û kurdperwer "Behzad Dorsin "Di sala 1963an de, li bajarê Dêrikê ji dayîkbûye,Xwendina xwe ya seretayî û amedeyî li Dêrikê bi dawî kiriye. Di sala 1984an de, bawernameya Peymangeha Amadekirina Mamosteyan li Hesekê wergirtiye û piştre bawernameya lêsans ji kolêja perwerdehiyê ya zanîngeha Feratê wergirtiye.. Di sala 1980an de, di ciwaniya xwe de tevlî nava refên tevgera Kurdî ya Partiya Demokrata kurd li Sûriyê El Partî bûye, û piştre di rêxistina xwendekaran li bajarê Hesekê de xebitî.

-Di kongirê 10an de, yê partiyê ku di Gulana sala 2007an de,hate li darxistin û têde "Dorsin "weku endamê komîta navendî ya PDK-Sê hat hilbijartin.. -Di sala 2012an de, ji bo xurtbûna karê "Dorsin" ya netewayî û niştîmanî hate hilbijartin ji bo endamê polîtpîroya Partiya Demoqrata kurdistan_Sûriya.

-Di 26 Cotmeha 2011an de, bû endamê desteya cîbicîkar a Encûmena Niştîmaniya Kurdî li Sûriya. Di derbarî kar û xebata Dorsin gelek helwestên partî yên rêxistinî wergirtin,û berpirsên encûmena herêmî ya Encûmena Niştîmaniya kurd li Sûriyê li bajarê Dêrikê wergirt. Û tê zanîn ku di "24ê Cotmeha 2012an de, li gel Nîdal Selîm endamê PDK-Sê, hatin revandin û ta niha çarenivîsa wan nediyar e.

# 39 sal in Cegerxwîn ji nav me bar kiriye

Kurdistan

Roja 22ê Cotmeha sala 1984an li Stocholmê Paytexta Siwêd, nivîskar û Helbestvanê navdar Cegerxwîn koça dawiyê kiribû. Seydayê Cegerxwîn li pişt xwe berhemeke dewlemed ji helbest, ferheng û çîrokan hiştiye. Cegerxwîn jiyana xwe di nava wêje û siyasetê de derbas kir. Ji ber karê xwe yê siyasî jî, çend caran ji Kurdistana Sûriyê derketiye.
Sala hezar û nehsed û sê ez hatim dinyayê
Bi navê Siltan Şêxmûs ez çêbûme ji dayê
Heta bûm sêzde salî li gundê me'y Hesarê
Jîna xwe min diborand, paşê ji wê me da rê
Seyda Cegerxwîn di wêjeya Kurdî de xwediyê roleke mezin bû. Bi edebiyata Kurdî jî hatiye binavkirin.
Di sala 1920an li dibistana olperestî xwend û ji bo xwendinê, çend salan li Kurdistana Iraq, Kurdistana Îran û Kurdistana Sûriyê geriyaya û ji nêzîk ve rewşa miletê Kurd li parçeyên Kurdistanê şopand.
Seyda li sala 1927'an jiyana hevjîniyê ligel keça xalê xwe pêk anî û li Amûdê bicih bibûn. Sala 1928 yekem dîwana xwe nivîsand ku tê de behsa jiyana xwe jî kir.
Cegerxwîn û hevalên xwe li sala 1937-1938'an Komeleya ciwanan li bajarê Amûdê vekirin, lê wê demê Fransiyan girt.
Sala 1946an Cegerxwîn mala xwe bir Qamişlo û dest bi jiyana siyasî kir û bi Komeleya Xweybûn re kar kir. Di wê salê de bi hevalên xwe re Civata Azadî û Yekîtiya Kurd avakirin. Dr. Ehmed Nafiz serok wê bû û Cegerxwîn jî sekreterê wê bû.
Seyda ji sala 1946an heta sala 1973an jiyana xwe di navbera Kurdistana Sûriyê, Kurdistana Iraqê û Libnanê de derbas kir.
Gelek caran ji ber kar û xebata xwe ya siyasî, ji aliyê rejîma Sûriyê ve hatiye girtin. Ji ber gufaşên zêde yên desthilata Sûriyê, neçar ma di sala 1979an de koçî welatê Siwêdê bibe û jiyana xwe li wir derbas bike.
Cegerxwîn roja 22ê Cotmeha sala 1984an li Stokholmê koça dawiyê kir û li pişt xwe berhemeke dewlemend ku ji 8 dîwanên helbestê û 11 pirtûkên ku behsa dîrok û ferhenga kurdan dike pêk tê, li pişt xwe hîşt. Herweha nêzîkî 29 pirtûkên wî yên din jî hene, lê hîn nehatine çapkirin. Gelek hunermendên kurd helbestên wî kirine sitran, ya herî bi navûdeng jî "Kî Me Ez" ku hunermend Şivan Perwer straye. Helbestvanê mezin Cegerxwîn di jiyana xwe de li ser gelek tiştan rawestiye û nivîsiye. Bang û hawarên wî her tim ji bo yekîtiya Kurdan û azadiya Kurdistanê bûn. Di helbestên xwe de behsa her tiştî kiriye, ziman, dayik, welat, jin, jiyan, evîn, xebat û têkoşînê û li ser hejar û dewlemendan jî nivîsanisye. Lewma gotin û helbestên wî li ser zimanê her Kurdekî ne.



## Pûng



Dr. Munîb Ehmad

Pûng yek ji giyayên navdare li ser asta Cihanî li ser her derî şîn tê li dora Çema û li deverên Axa Tirr. Ji 10-120cm dirêj dibê ,gelek corê Pûngê peîda dibin dighêjê ta 42 core , Pûng Giyakî temen dirêje bihna pûngê gelek xweşe Rengê keskaîya pûngê zor ciwane,
Ji mêj ve yonanî û Romanî Baqê pûngê datanin li ser serê xwe di Şahiyan de wekû ciwan karî û Pûng didanin ser xwarina xwe her weha dixistin nava xwarinê de û jê Şorbe çê dikirin û dixistin nav Meiyê de (Meşrûbê).
Pêkhatiya Kimawî:di Pelên û gûlên Pûngê de pêkhatiya herî giring Petrolên Firîne(زيوت طيارة) cih digrin ew jî Mada Mintole ya kû tameke Taîbet (Tûj,hînik) didê gava Mirov dixwê û bihna wê jî bîna her Mentolê ye ji bilî Mentolê ,Menton, Pîlegon, Mentefûran, Valiriyan Osîd, û di Dûhnê (Zeît)a Pûngê de Têrpîn (L-Limonên,û Felandipên ,a-û B -Pinên )ji hene û di Pelên Pûngê de Oksid ûrsol ê Oliksanol hene .
Beşê li ser Ardê wekû Giyaderman tê bi karanin di dema kû kûlîlk didê berî nivro tê danahev di vî wextî de Mada Mentol di piraniya xwe de ye ,dixin Baq û li ber sîkê tê ziwakirin û bi karanîna Têknikeke Taîbet jê (Mentol Oil) an kû Zeîta Pûngê û kû em vê Zeîtê texin cîkî sar ji 4-10 c derece wê bibê wekû Tozê "Kristal" û ev bixwe Mada herî giringe kû dixin nav Şeraba ji bo Kûxikê û dixin nava Berikê Tirşiya Midê û dixin nav Macûna Dirana Toz û Zeîta Pûngê dixine nav Dermana de weke (Validol Zelênîn )
Pûng bi Giyayên di re wekû Zihûrat tê vexwarin .
Pûng Dermanekî başe ji bo Qolinca hinava û xwarinê di hinava de baş dihêrê .
Bav û Kalên me Kûrda gelen pend gotine yek ji wan li ser Pûngê û Mar "Mar ji Pûngê aciz bû Pûng jî çû li ber devê qûla Mar de Şîn bû".
Bi kurdî :pûng
Bi Latinî:Mentha piperita
Bi :Rûssî мята перечная
Bi Arebî:نعناع
Bi Ingilizî:Mint
Bi Firensî:Menthe



## Bûk û Xesû



Henan Cefer

Naz û Pelşîn herdu bûka gundekî ne û hemsiyê hevin, rojekê Naz diçe mala Pelşînê piştî li rewş û dema hev pirsîn, qehwe vexwarin Pelşîna xenc gelek şanaz û ji xwe xweş bû Nazê dibe oda xwe tiştên bûkaniya xwe rabenî wê dike ji bîn, boyax, kil, sorav û alavên ciwankirinê her tişt heya cil û diyariyên din, heya demekê bi hev re dikevin teybetmendiyên hev lê Naz xwe pir nade ser peyvên wê guhdariya wê dike û piçekê li dijwariya wê tê çima bûkaniya wê ne bi xweşiya dilê wê bû tenê diya wê zepkirî bû û her tişt bi destê dayîkê hatibû kirîn wê lome jî ew ji kelûpelê xwe ne razî bû pir caran bi ser xwe de diponijî, Pelşînê têbîn kir ev xalake lawiz e, Pelşîn bi qander xwe bû mêrê xwe li gor xweşiya xwe dimeşand bi zanebûn û hezkirin diket dilê wî bi peyv û hestên nazik di her aliyekî de li sazê dixist, mêrê xwe kiribû paxila hezkirina xwe, ne mêrê xwe tinehî bû lê wê bi dilovanî û hezkirin dihêşt peyvên xwe werin bîstin û bikaranîn mîna zagon di mal de olan bû ev yeka li ba wê asayî bû û ji sexleta wê bû. Naz diçe mal serûbinî hev bûye di xwe de diqetê li ber kelûpelê xwe radiwestê carek, du caran, sê-çar caran lê mêze dike bi hêrs dest davêjê li hindir belav dike vir de wir de davêjê û bi xwe re dibêje ez jî bûkim û ew jî bûke nalet li bextê min were ne ez bim ne bûk û bûkaniya min be
-her ku diçe ba Pelşînê û vedigere mal dikeve teşeya xirab çimkîn xwe kêmtirî wê dibînê û dizanê mêrê xwe ji wan dewlementire lê çikûsî ye şad e bi diravan ji mal û hevjîna xwe pirtir bi tenahiya xwe ye ji aliyê hevjîna xwe ve xemsar e vê re nade û nastênê
-Rojekê Pelşîn tê ba Nazê demê bi hewşê dikevê çawa çav bi Nazê dikevin bilez û bi germahî xwe davêje ser û hev hembêz dikin, hev radimûsin û diçe destê xesûya Nazê maç dike, ziman xweş e di demek kurt de barek peyv kirin, Pelşîn dest di destê Nazê re dike û dizivirin oda Nazê dilê Nazê xweş dike lê Naz dilşkestî ye, dilmayî ye ne qelen, ne zewacî bi dilê wê bû û ne heya hezkirin û bi ser de di mal de her tişt bi dilê xesûyê ye pir caran dikevê hindirê xwe û bi dizika hêsiran dibarînê, kesî naza wê xweş bike nîne.
-Naz bi elendê re şiyar dibe medeh lihevdikevê dibezê serşokê velûdikê rojê sê-çar caran wisa dibê demê dizanê ducanî ye dikevê astenga dirûnî diramê çawa ê xwe ji vê barî kuta bike û biçûkê di malzarokê de bavêjê kir û nekir nikarî bû pê ve bû benîştê qurbetan, li dawiyê xweda keçek çeleng û rû gulgulî dayê û bi pêçeka xwe şad dibû, hemû êş û kiryarên dîtin e û nexweşiya bûkaniya xwe ji bîrvekirin.
-Pelşîn li pir bijîşkan geriyan xweda ti zarok nedanê encama bijîşkan gotin ji mêrê te daye, her çû ji bextewariya xwe dilsar bû, lê hezkirina ji dil bibû çepera qedexe ku xwe berdan bide lê Pelşîn ket bexta xesûya xwe çendî xesû li nav gund digerî û diçû serdanekê digot" bûka min zarokan nayînê xirş e'' – li ser vê nerindiya rûreşiyê Pelşîn çû mala bavê xwe û Naz her roj bi keça xwe şad û bextewar dibe.